6.9.1987

Sel Birlikten bir yazı

Halkın Kürsüsü

Kürtçe

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

TKP'nin Sesi 6.9.1987

Kürtçe:Sol Birlik'ten bir yazının

özeki(S.28)Yılmaz Güney Ahmet

207

Weki tê zanin 6 partiyên Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê dı Berf-barinapêşin ya ksala 1984'an da Yekıtiyek damezırandın,hêzên xwe yekkırı Partiya Pêşeng a Karkerên Kurdıstan,Partiya Karkerên Tırkiyê,Partiya Keda Komunıst ya Tırkiyê,Partiya Komunıst ya Tırkiyê,Partiya Sosyalist y Kurdıstana Tırkiyê,Partiya Sosyalistya Karker;ên Tırkiyê dı nav Yekıtiya Çep a Tırkiyê Kurdıstana Tırkiyê da hêzên xwe yekkırına.

Jı bo ku rejima Evren-Ozal jı ser hukım were dûrxıstın,jı bo ku demokrasi were welat,jı bo ku rêya rızgariya netewi û civaki ya gelê Kurd û Tırk were vekırın,jı bo ku Kurd û Tırk hemû gel bıgıhêje heq û azadiyên xwe Yekıtiya Çep tekoşinê dıke.

Guhdarên delal,~~Yekxkiyaxçepx~~bı navê Yekıtiya Çep jı mehê carekê rojnameyek derdıkeve.Dı rûpelên rojnama Yekıtiya Çep da hım bıTırki

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

hım ji bı Kurdi nıvis tên veşandın.Em dıxwazın jı hejmara 28'an ya rojnama Yekıtiya Çep nıvisekê bı kurti pêşkeşi we bıkın.Serenavê nıvisê wûsa ye:"Dıji gelê Kurd û tekoşina netewiya demokratik ya wi êrişek nuh. ~~Nıvisa serê waliyê hêrami~~ Dı nıvisê da pere pêşin nişan dıbe ku ~~dı~~ jı aliyê mıjûlbûnê da waliyê hêrami nuh nine,hin pêşiya 12 Kewçerinê hatıbû rojinê.Lê vê çaxê gırêki nedit,dı bınê rejima diktatoriya 12 Kewçerinî da jı nuh ve hat rojinê.

Guhdarên delal,rojnama Yekıtiya Çep qasi ku dı rojnaman da eşkere bûne hemû fermanên waliyê hêrami yek bı yek rêzdıke.Û nişandıbe ku gava merov lı van fermanan bınêrın,merov dıkarın jı iro da bıbinın ku wê lı Kurdıstanê çı bıbe,çı ki riya gelê Kurd ~~dıpê~~ sekıniye?.Lıcem hemû cendırme û hêzên polês an yê hêramê timên taybet ji dı bınê fermana waliyê

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

hêramê da ne.Waliyê hêramê bıxwaze dıkare gundan valabıke,dı bınê navê"gundên komi" da qampên berefkırınê bıdamezırine.Bı çı teheri bıxwaze dıkare xercbıke û hesab nade tu kesi.Bı kurti Waliyê hêramê kê bı dardake dardadıke,kê şerjêke şerjêdıke.Merov vexta vana hemûyan bine cem hev dı nav dewletê da dewlet tê aqılê merova.

Rejima Evren-Ozal,lı Kurdıstana Tırkiyê bı taybeti dı demên dawin da bûyerên ku ceryan kırıne dıke mane û qaşo bıkê navê "tekoşina dıj terorê" dıbêje ew "pındamana" hatıne gırtın.Hemû pêşverû,demokrat û bırek mezın yê waelatparêzên Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê dıbinın ku bı eslê xwe afırandiverê terora ku lı Kurdıstanê dıdome rejima diktatori bı xwe ye.

Rejima faşist,jı bo ku lı Kurdıstana Tırkiyê gelê Kurd hev û dın qırbıke,bı zorê,bı gefgazan şıxwıli ku quruma"Paraskarên gund" bıafırine.

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

Bı ahaki ew bısilehkırın kû dıjmınatiya ku hebû kışkır,şerê dı nav eşiran da bılezkır.Bı kurti qiret kır ku paraskarên gund lı dıji tewgera welatparêz a Kurd bıemıline.Lı ~~xxjx~~ hemberê hemû muxalefeta ku lı dıji pêkaninên "Paraskarên gund" bılındbûye rejima diktatori û hêzên militarist yên paş dı domandına viya da bı serdayinın.

İro quruma waliyê hêramiyê halê nehiniti jı hêla gelê Kurd da pêkaninek nuh ya "Takriri sukun",avagehek nuh ya "Mufettişiya Umumi" ye.Jı damezırandına Komarê şûnda dı demek kurt da rêbırına Tırk ya vê demê jı bo ku tekoşina azadiya gelê Kurd bıperçıqine "Takriri Sukun" u avageha "Mufetişiya umumi" dexıstıbû,rejima Evren-Ozal bı naveki nuh ajotın piyesê.

Rejima diktatori qaşo jı hemû bajarên Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê rêbırınaleşkeri rakırın.Lê belê lı Kurdıstana Tırkiyê bı

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI TÜSTAV

sazkırına waliyê hêramê ve vê rêbırınaleşkeri dı bınê maskeya sıvil da hin ji har were ajotın.

Lı Kurdıstanê jı bo terora devletê rêyek nuh hat vekırın.

Jı bo ku planên rejimê yên ber bi gelê Kurd vala werın erxıstın vezifên gıring dıkevın ser pêşverû,demokrat,şoreşger,hêzên welatparêz yên Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê.Gere em jı efkarê ûmûmi ra bıbêjın ku hûrındarkırına pırsiyara Kurd xancax dı heqê qedera xwe bı azadi kıfşkırınê da derbas dıbe,Gere em efkarî ûmumi jı vi aliyi da sazbıkın. Gere em peyda bıkın ku lı dıji zordestiyên rejimê yên ser gelê Kurd bêdeng nemînın.

Gelê Kurd ji dıxwaze lı welatê xwe bı azadi bıji,keda wi neyê xwarı bı mırovi bıji.Gelê Kurd ji weki gelên dın dıxwaze bı azadi qedera xwe tayin bıke.

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI
TUSTAV

6 gelê Tırk û hêzên wi yê pêşverû û şoreşger lı dıji hovitiyên rejimê,dı rojek ahaki da gere carek dın ji bıdın xuyakırın ku lı cem gelê Kurdın.Rejima diktatoriyê dıjmınê hevkar yê gelên Tırk û Kurd e.

Müzik: 147

Lawê gelê Kurd yê hêja,hunermendê mezın,artist û rejisorê bı nav û deng Yılmaz Guney jıbirnebû,tu car jıbirnabe! müzik üzerine.

Erê xwişk û bırayên delal,guhdarên hêja,3 sal berê dı roja 9 Kew-çerin 1984'an da lawê gelê Kurd yê mezın Yılmaz Guney lı Parisê çavên xwe lı jiyanê gırt,çû ser heqiya xwe.Bê şık bı mırına Yılmaz Guney gelê Kurd laweki xweyê mêrxas,gelê Tırk û gelên dınê hunermendeki hêja wundakır.

Yılmaz Guney dı sala 1937'an da lı bajarê Edenê,hat dınê.

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI
TÜSTAV

Malbata Yılmaz Guney jı Kurdıstana Tırkiyê hatıbûn Çukurovayê. Zaroti û destpêka xortaniya wi,lı Çukurovayê derbasbû.Pıştra dest bı nıvisandınê kır.

Yılmaz Guney cara pêşin dı sala 1960'i da jı ber serpêhatiyek xwe hat gırtın.Du sal ceza jê ra bırin.Jı van du salan 18 meh dı gırtigehê da derbaskır.Paşê dı sala 1968'an da bı navê "Seyit Xan" senaryoya filmeki nıvisi û bı xwe ji dı vi filmî da leyist.Jı vi filmi şûnda navê Yılmaz Guney lı Hemû Tırkiyê bela bû.Lê polês,cendırme dadgeh û gırtigeh ji lı pêşiya vi kêm nebûn.Dı sala 1971'an da carek dın ji ket zindanê û dadgehan jê ra 10 sal ceza bırin.Dı dawiya sala 1974an da dı efûya gışti da Yılmaz Guney ji jı gırtigehê derket.Disa dest bı karê xwe kır.Lı cem sinemayê bı siyasetê ve ji mıjûl bû.

Yılmaz Guney ne tenê filmçêkır,listıkvan û rejisor bû.Ew wûsa ji nıviskar bû.Navê hınek roman û serpêhatiyên wi wûsa ne:Birgün(Rojek)-
1952

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

Boynu Bükük Öldüler(Ew bı stûxwari mırın-1961),Hücrem(Hucra mın-1972 Selimiye Mektupları-(Nameyên Selimyê-1972 ûhw.

Nıha roman û serpêhatiyên Yılmaz Guney bı gelek zımanê navbernetewi hatıne veşandın.Yılmaz Guney heta roja mırına xwe jı sedi zêdetır filman da yan bı xwe lèyistiye,yan ji senaryoya van nıvisiye û rejisori kıriye.Dı filmên xwe da bı pırani rewşa gel,rewşa karker û xebatkaran, aniye ber çavan.Bı taybeti ji dı nav salên 1970' an da pırsên gundi û xebatkaran dı filmên wi da xweş tên ber çavan.

Yılmaz Guney dı jiyana xweya 47 salan da bı temami 12 sal dı gırtigehan da derbaskır.Lê wi tu car bir û baweriya xwe wunda nekır,lı dıji zılm û zordestiyê stûyê xwe xwarnekır.Ne tırsiya,bêdeng nema,hêviya xwe jı rojên xweş nebıri.

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI TUSTAV

Dı gırtigehê da ji xebata xwe domand.Dı hundır da senaryoya 3 filman nıvisi.Dı sala 1978'an da "Keri",dı sala 1979'an da ji senaryoya Rê û Dıjmın nıvisi.

Dı nav filmên Yılmaz Guney da hınek filmên bı nav û deng evanane "Zagonên sinoram","Tırs","Seyitxan,","Hêvi","Strana şinê","Heval", Dıjmın","Keri","Rê","Diwar" ûhw.Filmê Seyit Xan lı Kurdıstana Tırkiyê hat kışandın.Babeta film edet û kevneşopiyên Kurdanın.Bı filmê Hêvi Yılmaz Guney dı sinema Tırkiyê da dewrek nuh vekır.Babeta filma Keri serpêhatiya eşirek Kurde ku keriyê pêzê xwe jı Kurdıstana Tırkiyê dıbe Enqerayê.Dı filmê Koçero da jiyana mehkumeki Kurd,şerê navbera eşirên Kurd,sedemên mehkumiyê tên ber çavan.Dı filma "Rê" da Yılmaz Guney bı stilek nuh û filmvaniyek nuh tê pêş çavan.Dı vi filmi da cara ewıline ku dı perdeyên sinemayê da navê Kurd û Kurdıstanê

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

hat nişankırın.Bı taybeti bı filmê Rê navê Yılmaz Guney lı hemû cihanê bela bû.Filma "Rê" dı festivala navbernetewiya Cannes-1982'an da bû filma yekem û xelata zêrin xxstand.Jı vê sedemê ji lı hemû cihanê nav û deng da.Bı mehan lı hemû Ewrûpayê hat nişandan.Bı milyonan kesan ew filma temaşe kır.

~~xxlmaxxGuneyxfxxmêxxneyêxdaxinxdaxsalaxxl982xanxdaxxFransayê~~

~~çêkxxxx~~ Yılmaz Guney dı dawiya sala 1981'ê da jı gırtigehê rewiya û derket derveyi welat.Lê lı derveyi welat ji vala nesekıni,kar û barê xwe ajot.Dı nav xxendamên himdarên Enstituya Kurdi ya Parisê da ciyê xwe gırt.Lı Parisê bı navê "Diwar" filmek çêkır..Dı vi filmê xwwyê dawin da lı ser rewşa zarokên gırti sekıni,re şa gırtigehan da ber çavan.

Yılmaz Guney dı 9 Kewxçêrin 1984'an da lı Parisê dı 47 saliya xwe da jı nav me bakkır,çû ser heqiya xwe.Gelê Kurd laweki xweyê hêja,

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI
TÜSTAV

sinema Tırkiyê û dınê hunermendeki xweyê mezın wunda kır.xxxxxx
Pıştî mırına Yılmaz Guney,rejisorê Tırkiyê Lutfi Akad wûsa dıgot:

"Ger dı sinema Tırkiyê da,jı nav yên heri baş bıjartın bê çêkırın, yê yekem Yılmaz Guney e.Yê duwem,sêyem,çarem disa ew e.Dıbe ku rêza heyştan yan ji nehan da yeki dın lı dû wi were."

Erê,hunermendexxxxxxxx mezın Yılmaz Guney dı bıhara jiyana xwe da jı nav me veqetiya,çû ser heqiya xwe.İro lı Tırkiyê ,film, pırtûk,afiş û wêneyên Yılmaz Guney qedexene.Lê Yılmaz Guney dı gxx dılê gelê Kurd û Tırk da ciyê xwe gırtiye.Tu kes,tu hêzek nıkare xxwi jı dılê gelê Kurd û Tırk derxine.Yılmaz Guney wê tım û tım dı dılê Gelê Kurd û Tırk da bıji.

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

TKP'nin Sesi

Halkın Kürsüsü

---Merhaba d. dostlar... Bir programda yine birlikteyiz. D. dinleyiciler biliyorsunuz, 1 Eylül dünya barış günü tüm dünyada, bu arada ülkemiz barış güçleri arasında çeşitli biçimlerde kutlandı. Tüm dünyada 1 eylül barış günü nedeniyle 2000 yılında atom silahlarından arındırılmış bir dünya özlemi dile getirildi. Bilindiği gibi 1 eylül 1939 günü faşist Hitler ordularının Polonya'ya saldırıp, Varşovayı bombalaması üzerine 2. Dünya savaşı başlamıştı. Bu savaş 50 milyonu aşkın asker ve sivilin ölümüne, insanlığın yüzlerce yılda biriktirdiği kültür mirasının yokolmasına, sayisız kentin haritadan silinmesine onarılması imkansız zarar ve acılara yol açmıştı. Bu nedenle 1 eylül günü savaşın bitiminden bu yana tüm dünyada barış günü olarak kutlanıyor,

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

Ancak d. dinleyiciler, ülkemizde 12 eylül 1980'e kadar 1 eylül dünya barış günü kutlamalarını düzenleyen Barış derneği yedi ~~ym~~ yıldır kapalı tutuluyor ve yöneticileri hakkındaki ağır hapis cezaları hala askeri yargıtayda bekletiliyor.

D. dinleyiciler... ~~dünya barış günü nedeniyle, dinleyicilerimizin barış hakkında yazdıkları mektupları tekrar yayınlamak istiyoruz Şunu da belirtmek istiyoruz ki;~~ Yine hatırlayacağınız gibi teknik çalışmalar ~~nda~~ nedeniyle bir süre radyomuzun yayınları sizlere düzenli olarak ulaşamadı. ~~Bu~~ Bu nedenle bugünkü programımızda, radyo yayınlarımızın sizlere düzenli ulaşmadığı dönemdeki yayımladığımız Halkın Kürsüsü programlarından derlediğimiz barış mektuplarını sunacağız.

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

D. dinleyiciler... İlk mektubumuz, Kars'tan Sabiha Sertel imzasıyla yazan dinleyicimize ait. Dinleyicimiz , " barış gelecek ve komünistler" diye başlı yor ve şunları yazıyor.

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI